
Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :446 nameronahi@gmail.com 12- îlon - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Axa Rojava ji bo daran berhemdar e



Bi armanca naskirina cureyên darên berhemdar navenda Lêkolînên Zanistî ya Çandiniyê ya Kantona Hesekê gelek cureyên daran çandin.
Proje li nêzî gundê Til Mecdel ê başûrê rojhilatê Hesekê hate avakirin. Zêdetirî hezar darên tirî, sedan darên sêv, hinar û zeytûn û tevî gelek cureyên din li ser qada 200 donim hatin çandin.
Proje bi armanca naskirina guncawbûna cureyên hin daran ji bo çandiniyê li Cizîrê, di Sibata 2018'an hate despê kirin. Komîte hewl dide bi rêya projeyê cureyên baş ji wan daran derxe.
Di destpêkê de komîteyê ax û av tehlîl kir û piştre cureyên guncaw hilbijart. Komîte wê şitlan li ser cotkarên herêmê belav bike.
Ji bo meşandina xebatên projeyê 3 endezyarên çandiniyê û hejmarek karker ji bo avdana daran dixebitin. Têkildarî mijarê endamê rêveber ê navenda Lêkolînên Zanistî ya Çandiniyê ya Kantona Hesekê endezyar Talal Abdulbarî Xelîl diyar kir ku armanca projeyê naskirina asta serketina çandiniyê li herêma Cizîrê ye.
Xelîl wiha got: "Beriya niha darên sêvan li



herêmê nehatibûn çandin. Ji bo naskirina serketina çandina darên sêvan, niha me dar çand û di sala bê de wê bi rêya aşlekirinê hejmara daran zêde bibin."
Têkildarî mijara serketina projeyê Xelîl destnîşan kir ku proje bi rêjeya ji sedî 95 bi serketiye û wiha got: "Proje wê lêçûnên anîna fêkî û zeytûn ji derveyî Cizîrê kêm bikin."...***ANHA***





# Ava kanalîzasyonê ji bo çandiniyê bi kar tînin

Li ser çemê Xabûr ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hate qutkirin û li şûna wê ava kanalîzasyonan hate berdan, çandiniya sebze tê kirin



û sebze li sûka Serêkaniyê tên firotin. Li gel hewldanên saziyên eleqedar jî heta niha çandina sebzeyan nehatiye rawestandin.
Li gorî welatiyên heremê, çemê Xabûr heta sala 1995'an jî çemekî mezin, paqij û zelal bû. Gelê herêmê ji çem av vedixwar, masî digirtin û pê çandinî dikirin.
Dewleta Tirk a dagirker bi kolana 4 hezar bîrên behrî (ku di navbera 1000- 1500 metre de kûr tên kolandin), çêkirina bend û kanalan, çîmento xistina kaniyan, ava binerdî ya Serêkaniyê qut kir. Dewleta Tirk a dagirker bi çêkirina bend û kanalan pêşiya çemê Xabûr girt. Çemê Xabûr di salên 2000'î de ji binî ve qut bû.
Piştî ku di sala 2013'an de çeteyên Cebhet El-Nusra ji Serêkaniyê hatin derxistin, dewleta Tirk a dagirker di kanala çemê Xabûr re ava kanalîzasyonê berda ser rojavayê Kurdistanê. Niha çemê Xabûr bi temamî qut bûye û li şûna wî ava kanalîzasyona Tirkiyê diherike.
Di mehên havînê de ava kanalîzasyonê 8 km dirêj diherike û di zivistanê de jî bi ava baranê re hetanî Dêrazorê diherike. Ev çemê ava qirêjî bêhnê belavî derdorê dike, kermêşên li ser mezin dibin zirarê didin derdorê. Lê ya herî giring jî di Serêkaniyê de dirêjiya 8 km zeviyên çandiniya sebze li ser ava kanalîzasyonê tê çandin.
Gel jeneratoran datînin ser ava kanalîzasyonê û zeviyên xwe pê av didin. Li gorî ku welatî dibêjin, gundên derdorê sebzeyên xwe bi ava kanalîzasyonê ava didin û ew zebze jî yekser tên sûka Serêkaniyê.
Der barê çareserkirina pirsgirêkê de hevserokê Meclisa bajaroka Til Helef Ebdullqadir Ebdullqadir diyar kir ku ew wek kesek ku beşê tenduristiyê xwendiye av zirareke mezin dide tenduristiya gel û wiha got: "Ev av dibe sedema navçûn, penceşêr, di xwînê de bakteriyên xirab çêdike, jiberçûna jinên ducanî û gelek nexweşiyên din."
Her çendî Rêveberiya Xweser xwest ji bo rawestandina ava kanalîzasyonê bi rayedarên Tirk re bikeve nava têkiliyan de jî ji ber polîtikaya Tirkiyê ya li dijberî Kurdan ev rûniştin pêk nehat. Ev nêzî 4 sal e çandinî li ser vê ava qirêj tê kirin. Ji beriya mehekê ve Rêveberiya Çandinî û Sewalkariyê ya Serêkaniyê xwest çandiniya bi ava qirêjî rawestîne.
Di serê meha Nîsanê de Desteya Şaredariyan a Herêma Cizîrê ji bo qedexekirina sebze, fêkî û tiştên xwarinê li ser avên qirêj ji hemû şaredariyên



herêmê re hişyarî rêkir. Piştî wê Şaredariya Serêkaniyê heman hişyarî li şaredariyên navçe û bajarokên herêma Serêkaniyê belav kir. Şaredariya Til Helef jî di 14'ê Nîsanê de hişyarî da cotkarên ku li ser ava kanalîsazyonê sebze diçînin. Hîn wê demê çandinî nehatibû kirin.
Lê cotkaran ev hişyarî di ber çavan re derbas nekir û çandiniya xwe berdewam kirin...
***ANHA***



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 446 12- îlon- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## YPG derbên giran li dagirkeran dide

Li Efrînê şervanên YPG'ê derbên giran li dagirkeran didin. Navenda Ragihandin û Çepamaniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî destnîşan kir ku di çarçoveya Qonaxa Duyemîn a Berxwedana Serdemê ya li Efrînê de, çalakiyên yekîneyên wan ên li dijî dagirkeran dewam dikin. YPG'ê diyar kir li Efrînê çeteyên bi navê Xalid el- Feyîz û Mesûd el-Faris yên girêdayî Feyleq El Şam bi çalakiyekê hatine kuştin.***R-2***

# ÎRAN ALOZIYA HERÊMÊ KÛR DIKE

**Dewleta Îranê di rojeva cîhanê ya sereke de cihê xwe digire. Rêjîma Îranê ku di nava aloziyeke mezin de ye bi êrîşkirina derve û kûrkirina aloziya herêmê xwe ji guherînê re digire û hewl dide temenê xwe dirêj bike. Rêjîma Îranê jî daye ser rêya rêjîma Tirkiyê êrîşî Kurdan dike.**



## DIVÊ KURD LI HEMBER ÊRÎŞAN BIBIN YEK

Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê PJAK'ê derbarê darvekirina sê ciwanên Kurd û êrîşa Îranê ya li ser baregehên HDK û PDK-Î daxuyaniyek da û êrîş şermezar kir. PJAK'ê wiha got, "Di vê dema hestyar de ku celad ciwanên gelê Kurd darve dikin, pêwîst e hemû hizb û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê alozî û nakokiyên xwe bidin aliyekî û yekîtiyê bikin rojeva xwe." ***R-4***




## HEMÛ ALÎ ZIYANÊ DIBÎNIN

Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê bi daxuyaniyekê êrîşên rêjîma Îranê yên li dijî başûrê Kurdistanê û darvekirina sê çalakvanên siyasî yên Kurd Ramîn Pinahî, Zanyar û Luqman Muradî bi tundî şermezar kir. PYD'ê got, "Îran jî weke Tirkiyê krîzeke cidî dijî. Ev siyaseta êrîşkirinê ya Îranê tenê aloziyê kûrtir dike û hemû alî jê zerarê dibînin." ***R-4***



## SAZIYÊN NAVNETEWÎ JÎ HEVPAR IN

Endamên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Firatê der barê êrîşên rêjîma Îranê ya li ser partiyên Rojhilatê Kurdistanê û darvekirina sê ciwanên Kurd daxuyaniyek da û dijmintiya Îranê ya li dijî gelê Kurd bi tundî şermezar kirin. Rêveberiya Kobanê wiha got, "saziyên navnetewî jî yên ku xwe weke parazvanên mafên mirovan dibînin bi bêdengiya xwe hevkarên êrîşên Îranê ne." ***R-5***



## ÎDAM WÊ TÊKOŞÎNA ME LEWAZ NEKE

Dayîka Zanyar Mûradî Amîne Qadirî jî diyar kir ku darvekirina kurê wê û qetilkirina hevjînê wê hêrsa wan a li hember zilma rejîma Îranê mezintir kiriye , da zanîn ku bi darvekirinan wê gav paşde nevêjin û ewê têkoşîna xwe hê bilindtir bikin. Amîne wiha got, "têkoşîn û xebatên bi awayekî hîn xurttir wê berdewam bikin. ***R-3***

# Dagirkeran 60 sivîlên din revandin



Kiryarên hovane yên leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk li Efrînê bê navber berdewam dikin. Hat ragihandin ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên Ehrar El Şam û Furqet El-Hemzat li gundê Kurzêlê yê navçeya Şerawa 60 sivîl revandin. Li aliyê din çeteyan li gund mal û milkên sivîlan talankirin. ***R-2***

## Hêjmara kesên bi nexweşiyê dikevin zêde dibe



Li kapmên Şehbayê yên ku welatiyên Efrînê lê dimînin nexweşî zêde dibe. Berdevka Koordînasyona Tenduristiyê ya Giştî ya herêma Şehbayê Rîm Qermo, bang li rêxistina tenduristiyê ya cîhanê û hemû rêxistinên alîkariyê kir ku alîkariyê pêşkêş bikin da ku rê li ber belavbûna nexweşiyan were girtin. ***R-6***


## Dewleta Tirk li siyasetmedên Kurd ceza barand

Zext û êrîşên dewleta Tirk yên li dijî gelê Kurd û siyasetmedarên Kurd bê navber dewam dikin. Dadgeha Tirk ceza li siyasetmedarên Kurd ên ku di 'Doza Sereke ya KCK-Wanê' de dihatin darizandin, barand. Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Wanê Bekîr Kaya jî di nav de ji 7 sal heta 9 salan ceza li siyasetmedarên Kurd hate birrîn. ***R-2***

## Li Şengalê perwerdeya zimanê dayîkê

Li Şengalê xebatên perwerdeya bi zimanê Kurdî berdewam dike. Di destpêka meha Tebaxê de dewreyek a perwerdeyê ji bo 132 mamostayan hatibû destpê kirin. Dewreya perwerdê ku ji aliyê Saziya Ziman û Perwerdeya Êzidiyan SZPÊ ve hatibû dest pê kirin bi awayekî serkeftî bi dawî bû. ***R-7***

## Divê her kes li dijî tecrîdê bikevin tevgerê




Tecrîda giran a li ser Rêber Ocalan her diçe girantir dibe. Birayê Rêber Ocalan Mihemed Ocalan herî dawî di 11'ê Îlona 2016'an de çûbû Îmraliyê û hevdîtin bi Rêber Ocalan re kir. Mihemed Ocalan diyar kir ku tecrîda li ser Rêber Ocalan gel diêşîne û bang li her kesî kir ku li dijî tecrîdê bikevin nava tevgerê. ***R-2***

## Tecrîd li dijî qanûnên navnetewî ye



Nerazîbûnên li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan roj bi roj zêde dibin. Parêzer û endamê Komîteya Dada Civakî yê Kantona Şehbayê Abdullah Mihemed Mistefa destnîşan kir ku tecrîd li dijî qanûnên navnetewî ye û bang li sazî û rêxistinên mafên mirovan kir ku li ber tecrîda li ser Rêber Ocalan rabin. ***R-5***

## Di hefteyekê de 59 leşker hatin kuştin




Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku gerîla li navçeyên Çelê û Şemzînan ên Colemêrgê û navçeya Cîzîr a Şirnexê li dijî leşkerên Tirk çalakiyên bi 'bandor' lidarxistine. HPG'ê ragihand ku di nava hefteyekê de 59 leşkerên Tirk di çalakiyên gerîlayan de hatine kuştin. ***R-2***

## DYA biryara girtina nûnertiya Filistînê da

Rêveberiya DYA piştî Kanûna 2017'an û şûnde Quds weke paytexta Îsraîl nas kir, nêzîkatiyên wê yên li dijî Filistînê hişk bûne. Rêveberiya DYA biryara girtina nûnertiya Filistîn a li Washîngtonê da. Rêxistina Rizgariya Filistîn, diyar kir ku DYA'yê têkildarî girtina nûnertiya li Washîngtonê rêveberiya Filistîn agahdar kirine. ***R-2***

# Dagirkeran 60 sivîlên din revandin

**_Kiryarên hovane yên leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk li Efrînê bê navber berdewam dikin. Hat ragihandin ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên Ehrar El Şam û Furqet El-Hemzat li gundê Kurzêlê yê navçeya Şerawa 60 sivîl revandin. Li aliyê din çeteyan li gund mal û milkên sivîlan talankirin._**

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê di nava 2 roj an de li gundê Kurzêlê yê navçeya Şêrawa ya Efrînê 60 sivîl revandin ku yek ji wan jin e.
Li gorî agahiyên ji herêmê hatine girtin artêşa Tirk a dagirker û çeteyên Ehrar El Şam û Furqet El-Hemzat li gundê Kurzêlê yê navçeya Şerawa 50 sivîl revandin.
Li aliyê din çeteyan li gund mal û milkên sivîlan talankirin.
Navê hinek sivîlên hatine revandin wiha ne ; Ferhat Hemkaro (25), Mazlum Qicê (25), Hisên Qicê (20), Zeki Hemkaro, Nuri Hecî (45), Mihemed Şamî (55) ve Sibhî Setaf (60)
Diyar bû çeteyan dema sivîl revandin êşkence li wan kirin e û ji malbatan daxwaza fîdyeyê dikin.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê sê roj berê jî li heman gundî 10 kes revandîbûn ku yek ji wan jin e.



## 2 çete li Efrînê hatin kuştin



YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku li gundê Stêr ê girêdayî navenda Efrînê du çeteyên girêdayî koma Feyleq el Şam hatine kuştin.



Navenda Ragihandin û Çepamaniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî li Efrînê çeteyên bi navê Xalid el- Feyîz û Mesûd el-Faris bi çalakiyekê hatiye kuştin.
YPG'ê destnîşan kir ku di çarçoveya Qonaxa Duyemîn a Berxwedana Serdemê ya li Efrînê de, çalakiyên yekîneyên wan ên li dijî artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê didomînin.
YPG'ê têkildarî çalakiyê ev agahî parve kir: "Di dîroka 9'ê Îlonê de hêzên me li dijî wesayîteke leşkerî ya koma çete ya bi navê Feylaq el-Şam li gundê Stêr ya girêdayî navenda bajarê Efrînê çalakiyek bi bandor pêk anîn. Di encama çalakiyê de wesayît bi temamî hate rûxandin û her du çeteyên bi navê Xalid el-Feyiz ê ji Hema û Mesûd el-Faris ê ji Îdlibê hatine kutşin Herwiha 2 çekên AK-47 hatin desteserkirin."

## Di hefteyekê de 59 leşker hatin kuştin




Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand ku di nava hefteyekê de 59 leşkerên Tirk di çalakiyên gerîlayan de hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku gerîla li navçeyên Çelê û Şemzînan ên Colemêrgê û navçeya Cîzîr a Şirnexê li dijî leşkerên Tirk çalakiyên bi 'bandor' lidarxistine.
HPG'ê di daxuyaniyê de ev agahî parve kir;
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li dijî artêşa TC'ê ya dagirker rêze çalakî lidarxist.
Agahiyên berfireh ên têkildarî çalakiyên wiha ne;
Hêzên me roja 8'ê Îlonê seat 08:00'an de li dijî leşkerên Tirk ên li girê Koordîne yê navçeya Çelê ya Colemêrgê bicih bûbûn çalakiyek lidar xist. Di çalakiyê de çeperên dijmin bû hedef, çeperek hate rûxandin û qasî hate tespîtkirin 4 leşker hatin kuştin.

### LI CIZÎRÊ WESAYÎTA TÎPA EJDER HATE RÛXANDIN

Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de roja 8'ê Îlonê seat 10:30'an li dijî 2 wesayîtên zirxî yên ku di navbera gundên Dader û Hesena yê navçeya Cizîr a Şirnexê dewriye digeriya çalakiyek lidar xist. Bi serketî li wesayîta zirxî ya tîpa ejder hate xistin û wesayît hate rûxandin. Di vê çalakiya bi bandor de hejmara kuştî û birîndaran nehate tespîtkirin. Hêzên dagirker seat 15:00'an de bi gelek wesayîtên zirxî hem enkaza wesayîtê û hem jî kuştî û birîndarên xwe rakirin.

### ÎDÎAYA '35 GERÎLA' DEREW E

Malpera fermî ya Wezareta Karê Navxwe ya dewleta Tirk û medyaya şerê taybet ragihandin ku vê heftiyê 35 gerîla şehîd bûne.
Daxuyaniya ku dane ti têkiliya xwe bi rastiyê re tine, bi temamî xwe dispêrê şerê psikolojik.

### DI NAVA HEFTEYEKÊ DE 59 LEŞKER HATIN KUŞTIN

Vê heftiya dawî li Colemêrg û Amedê bi giştî 5 hevalên me şehîd bûne û ev agahî bi raya giştî re hatine par ve kirin. Her wiha vê heftiya dawî hêzên me 22 çalakî pêk anîne, 59 leşker hatine kuştin, 3 wesayitên zirxî hatine rûxandin û 10 çalakî bi berfirehî ji aliyê me ve hê nehatine zelalkirin.

## Dewleta Tirk li siyasetmedên Kurd ceza barand

Dadgeha Tirk ceza li siyasetmedarên Kurd barand ên ku di 'Doza Sereke ya KCK-Wanê' de dihat darizandin.
Zextên qirkirina siyasî yên rejîma AKP-MHP'ê didome.
Siyasetmedarên ku di 'Doza Sereke ya KCK-Wanê' de dihat darizandin, ceza li wan hate barandin. Li Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Wanê Bekîr Kaya 8 sal û 9 meh, li yên din jî ji 7 sal û 6 mehan heta 8 sal û 9 mehan ceza hate birîn. Dadgehê biryara girtina hemû bersûcan da yên ku ne girtî bûn.
Saziya Darizandinê ji bo Kaya û 13 kesên ku bi hinceta ku çûne şînê, Newroz, Cejna Zimanê Kurdî, 8'ê Adarê û li wê derê axivîne, diyar kiribû ku ev tişt li dijî qanûnan e.



## Divê her kes li dijî tecrîdê bikevin tevgerê

Mihemed Ocalan herî dawî di 11'ê Îlona 2016'an de bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtin kir. Mihemed Ocalan got, "Birayê min 2 sal berê ji min re got "Ev pirsgirêk bi kuştinê çareser nabe. Ger bi kuştin çareser bûbûya, wê berî 40 salan çareser bûbûya." Mihemed Ocalan got, "Divê hemû kes li dijî tecrîdê bikevin nava tevgerê."
Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam dike.
Herî dawî birayê Rêber Ocalan Mihemed Ocalan di 11'ê Îlona 2016'an bi çûbû Îmraliyê. Mihemed Ocalan diyar kir ku ev du sale bi tu awayî agahî ji birayê xwe negirtiye. Mihemed Ocalan, diyar kir ku ev tecrîda li ser Ocalan siyasiye û wiha axivî: "Ez bang dikim ku hemû kes li dijî tecrîdê bikevin nava tevgerê."
Ocalan, anî ziman ku pêkanîna tecrîdê gel diêşînê û wiha got: "Li gorî qanûnan ew mafê hikûmxarekê heye ku hevdîtinê bi malbat û parêzerên xwe re bike. Lê ev qanûn ne ji bo malbat û ne jî ji bo parêzerên wî pêk tînin. Ev 2 salin bi tu awayî ji birayê xwe agahî nagirim. Ez hêvî dikim ku di rojên pêş me de rêya Îmraliyê vekin. Em ji bo xwe naxwazin. Ger ji bo me venakin, bila ji bo parêzer û şandeyên serbixwe vekin. Gel rewşa Ocalan mereq dike."



Ocalan, da zanîn ku di hevdîtina dawî de Rêber Ocalan nirxandinên giştî yên li ser pêvajoyê kirin û wiha got: "Wê demê greva birçîbûnê hebû. Me li ser vê hinekê axivî. Dûre em li ser pirsgirêka gelê Kurd axivîn. Ji min re got 'Ger dewlet derfetê bide min emê di nava 6 mehan de vê pirgirêkê çareser bikin. Di dawiya dawîn de wê dîsa aştî pêk bê. Ev pirsgirêk bi mirinê çareser nabe. Ger çareser bibûya, dê berî 40 salan çareser bibûya."

## DYA biryara girtina nûnertiya Filistînê da



Rêveberiya DYA biryara girtina nûnertiya Filistîn a li Washîngtonê da.
Rêxistina Rizgariya Filistîn (FKO), diyar kir ku DYA'yê têkildarî nûçeyên girtina nûnertiya li Washîngtonê rêveberiya Filistîn agahdar kirine.
Berpirsê asta jor ê rêveberiya Filistîn Saîb Erekat ji bo tedbîrên Amerîka got: "nakokiyên bi xeter'.
Erekat got: "Rêveberiya Trûmp li ser guşarên polîtîkayên cezakirina kolektîf a li dijî gelê Filistînê yeke din jî zêde kir." bibîr xist ku di serî de DYA alîkariya tenduristî û perwerde û gelek qadên din de dihate kirin qûtkiriye.Rêveberiya DYA piştî Kanûna 2017'an û şûnde Quds weke paytexta Îsraîl nas kir, nêzîkatiyên wê yên li dijî Filistînê hişk bûne.Rêxistina Rizgariya Filistînê, ji aliyê civaka navneteweyî ve weke nûnertiya gelê Filistînê tê naskirin.



# Hunera resen dagirkeriyê têk dibe

**Piştî ku gelê Efrînê neçar ma ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta tirk û çeteyên wê Efrînê terikand û li Şehbayê bi cih bû xebatên xwe yên rêxistinkirinê jî berdewam kir. Tevgera Çand û Hunerê li kampên Berxwedan û Serdemê navendên xwe vekir.**





**Idrîs HENAN**

Piştî koçberiya bi zorê ya gelê Efrînê, ji ber daxwaza zêde ya gelê Efrînê, Tevgera Çand û Huner li herdu kampên Berxwedan û Serdem, navçe û gundên Kantona Şehbayê navendên xwe vekir. Di navendan de dersên (mûzîk, wênesazî, stran, şano, …hwd) tên dayîn.

### HEJMAR HEZARÎ DERBAS DIKE

Rûmet Beko Endama Rêveberiya Tevgera Çand û Hunerê di vê derbarê de got: Gelê me bi riya tevlîbûna nava tevgera çandî pêşî li qirkirinên dewleta Tirk digire. Ji ber vê jî me li herdu kampên Berxwedan û Serdem dest pê kir û piştre jî derbasî hemû navçe û gundên Kantona Şehbayê bûn. Rûmet çawaniya birêxitinkirina kar wiha rave kir: Di destpêkê de nav dihatin tomarkirin. Beşên (stran, govend, şano û mûzîk) hatin vekirin. Rûmet destnîşan kir ku; avantaja ew e ku hemû kadroyên çandê li vir in. Rûmet diyar dike ku; hejmara kesên perwerdeyên çandê digirin Hezarî derbas dike.

### STODYOYA DENG Û RENG VEBÛ

Di aliyê rêxistinî de Tevgera Çand û Hunera Efrînê li Şehbayê li gorî beşên rêveberiyê komîteyên xwe yên rêveber ava kiriye. Komîna Sînama jî beşek jê ye. Ji bo hêsankirin û fêrkirina kar, di serî de komîteya perwerdê û ya nirxandinê hatine avakirin. Tevgera Çand û Hunera Efrînê gelek projeyên ku ji ber rewşa dagirkeriyê li Efrînê nîvcû mabûn, li Şehbayê temem kiriye û gelek lê zêde kiriye. Di vê mijarê de Nûnerê Tevgera Çand û Huner di Meclîsa Giştî ya Kantona Efrînê de li Şehbayê Henan Sîdo got: Ji ber rewşa êriş û dagirkeriyê hinek projeyên me kêm man. Li vê derê teknîka me jî tune bû. Piştî şeş mehan li kêleka beşan him teknîk dabîn bû û him stodyoya Deng û Reng jî amade bû. Henan eşkere kir ku; niha çar stranên li Efrînê amade bibûn, wê van rojan bên tomrkirin.

### PERWERDE PROFESYONAL IN

Henan derbarê beşan, perwerdevanan û projeyên di destê wan de ev agahî parve kir: Bi riya endamên Peymangeha Şano û şanogerên Efrînê Şanoya Gunehê Hespî ku bersiva rewşê bû û gelek skêtş hatin pêşkêşkirin. Di aliyê şanoyê de niha li ser gelek senaryoyan tê xebitandin. Ji bo avakirina kadroyên şanoyê jî, perwerdeyên profesyonal tên dayîn.

### ÇAR FÎLM DI RÊZÊ DE NE

Yek ji beşên ku karê wê nîvcû maye, Komîna Sînama ye. Henan li ser vê mijarê got: Komîna Sînama derbarê êrişên dagirkeriyê de heya roja me ya îro belgefîlmek bi navê Afrînerên Hêviyê amade kiriye. Ev film û tabloya hunerî ya bi navê Hemleya Tevgera Çandê ji bo Rizgarkirina Efrînê, biryarên Konferansa Rizgarkirina Efrînê bûn. Herdu jî amade ne. Henan dewam dike: Hinek fîlmên dîtir ên mîna (Zeytûna Sor, Helebçe, Vîndar) ber bi dawiyê ve diçin. Li rex van jî çar fîlmên din di rêzê de ne.

### ÇÎROKÊN BERXWEDANIYÊ TOMAR DIBIN

Henan Sîdo derbarê karê hatiye kirin de jî ev tişt anî ziman: Piştî hatina Şehbayê, bi sê mehan pêşengeha wênesaziya zarokan li kampan û ya floklor û kevneşopiya Kurdan li Şerawa hatin pêşandan. Hefteya hunerî li çar navçeyên Şêrawa, Ehdas, Ehres, Erfad, herud kampan û gelek gundewaran hate lidarxistin. Ji bo nivîsandina dîrokê û derxistina rastiya hovîtiya dewleta Tirk, niha endamên Stodyo çîrokên berxwedaniya gel tomar dikin.

### HEMÛ BEŞ LI NAVENDAN HENE

Rêbaz û şêwazên perwerdeyan Endama Rêveberiya Tevgera Çand û Hunera Efrînê li Şehbayê Rûmet Beko şîrove kir û got: Mebestas me bi perwerdeyan, li ser hîmên zanistî amadekirina kadroyên çandî ye. Li ku bê xwestin wê kadroyên me li wir bin. Ji ber vê jî me dest bi perwerdeya montaj, wênekêşî, wênexêzî, mûzîk, stran, govend û şanoyê kiriye. Li her navendeke me hemû beş hene. Bi awayekî profesyonal li navendan ders tên dayîn.

### EM Ê RIYA QIRKIRINÊ BIGIRIN

Herdu endamên Rêveberiya Tevgera Çand û Hunera Efrînê li Şehbayê di dawiya nirxandinên xwe de qirkirina çandî li Efrînê şermezar kirin û tekez kirin ku ew ê bi riya hunera xwe ya resen kiryarên dewleta Tirk li dunyayê bicerisînin û ev tişt gotin: Ji bo ku em rê li ber qirkirina çandî bigirin, em hewl didin hinek belgeselên ku rewşa dagirkerî û hovîtiya dewleta Tirk rave dikin, amade bikin. Bi têkoşîna xwe em ê rê li ber vê qirkirinê bigirin.




## Hunermend wicdanê civakê ye

**Hozan Seyîdxan**

Ronesans,di jiyana çanda muzîkê de buye xwediyê serdemeke girîng. Di va serdemêde kesê bixwesta bibe hunermend Mêr-Jin dibe an jî rewşenbir,hunermend,zanyar an jî dîplomat dibe pêwiste zanist(Teorî) a nuzîkê bizane,divîya pratîkêde pêkbianiya.Yên ku ev erka xwe bicî neanîba,nedikarî biafirîne ne dihate pejirandin.û ew wek kesên ne ji rêzê dihatin pênasekirin.
Modernîteya kapîtalîst jî bi salane kincê xwe bi riya çalakî, zikir û fikrên xwe li pişta mirovan kiriye û bê ser û ber berdaye bazara firotanê.Bi taybetî ev çalakiya xwe di qada dîtbarî û hunera muzîkêde bê sînor pêşdaxistiye. Huner û hunermendan,muzîk û muzîkjenên ku ji taybetmendiyê(yetenek) xwe bê bawerbûn û ne di asta afirandina huner û muzîka elternatîf dane ji bo berjewendiyên rojane bikartîne û bi erzanî berdide nava kolanên tarî. Bi pêwana(bi rêya) hunermendên bê rêxistin çanda dejenerekirinê pêşdadixe. Mînak,çanda şahiyê xîtabî ajoyên însanan dike. Vê yekê jî herî baş bi rêya takekesan dike. Çanda 'star'an bi vê mabestê hatiye pêşxistin û li ser civakê ferz kirin. Ji ber ku li dij vê nêzîkatiyê sekneke bihêz a exlaqî neyê nîşandan, qada mûzîkê wergeriyaye qada sermayeyê. Ev rewş jî ji endustriyalîzm a lingekî bingehîn ê modernîteyê ye re xizmetê dike. Bûyina endustrîbûnê ya muzîkê bi xwe re biyanîbûn jî aniye. Bi navê modernbûnê berhemên ji cewher hatine xistin, ên teqlîd bi navê cudabûnê ji naveroka derketin û dûrbûna ji naveroka qadîm a çanda Kurdî durketinê bi xwe re tîne. Li aliyê din arabesk a bûye zimanê bêhêvîbûn, qedervanî û gazincan jî rola tevizandina hemû dînamîkên civakê dimeşîne.
Rizîbûneke din a di qada muzîkê de derketiye jî dûrketina ji nirxên têkoşînê ye. Di serî de şehîd, gerîla, Rêber A.Ocalan û gelek nirx bi şêwazekî ji berpirsiyarê dûr bi rêya cd û klîban di vê qada hunerê da tên bikaranîn. Ev berhemên ji cewherê hunerî lawaz, ji estetîkê dûr, tenê propogandaya rijî nirxên gel,şoreşê tînîn asteke ji rêzê.Şehîdan û gerîlayan jiyana heyî hêjayî jiyînê nedîtin û hemû temenê xwe ji bo avakirina civaka azad û demokratîk derbas kirin. Yên ku di vê felsefeya rast û zelal de nagihijin, yên li gor feslefeya sîstemên roja me dijîn, ne karin Rêbertiyê, ne karin şehîdan ne karin gêrîlla ne karin azadiyê ne jî karin gerîlayan vebêjin.
Gelê kurd di vê sedsalê da di serîde li bakurê welat û bi taybet li rojava yê welat li dijî hemû zilma dagirkeran berxwedanên mezin çêkirin.Destanên bê hempa afirandin.Ji bo şikandina êrîşên zaliman bêne şikandin,canbaxşêyên leheng dîrokên nuh afirandin.Ev pêşxistina çav kaniyên mezin ji bo afirandina hunerê re derfetên zêrîn derxistine holê.
Ji ber pergala kapitalîst û birdoziya wê ya liberal, wexta ku merev dibê rêxistin tenê beşa siyasî û qada partiyên siyasî derdikeve pêsberî merev. Ji vê nakûkiya jî herî zêde hunermend bandor bûne.
Hunermendên ku bi dewletê re kar dikin û li cem wan cih distînin xwe baş bi rêxistin kirine.
Ên ku rêxistina xwe çênekirine û xwirt nekirine hûnermendên li dervê pergala dewletê û muxalefetên wê ne. Ji ber wê gereke yên herî bi rêxistin kirî hunermendên demokrat û welat parêz bana, berovacî wê yên herê kêm û qels ew mane.Hunermendên kurd yek erkik wan yê dîrokî û sereke heye."û carekedin vegerin jiyanê".Xwe bi zanistê rapêçin û bibin dengê azadiyê.Jiber ku hun temsîla wicdanê civakêne..

## Hovîtiya dagirkeran neqiş dike



Abdîn Nûrî Ebdulhemîd 63 salî ye, li navçeya Til Rifet a Şehbayê ye, bi tenê di odeyeke biçûk de dimîne û li ser textan nexşan çêdike.
Nexşên wî asta hovîtiya dewleta Tirk û berxwedana gelê Efrînê nîşan didin.
Abdîn Nûrî Ebdulhemîd ku niha li Şehbayê bi cih buye berxwedana xwe bi xêz kirina neqşan berdewam bike.
Abdîn Nûrî Ebdulhemîd 63 salî ye. Niha li navçeya Til Rifet a Şehbayê ye, bi tena xwe di odeyeke biçûk de dimîne.
Ebdulhemîd li ser textan neqşan çêdike, hemû tiştê di bala wî de, bûyerên rû didin û hwd. bi rêya neqşandina li ser textan parve dike.
Abdîn piştî ku bi çavên xwe êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê dibîne, êdî bi neqşan qala asta hovîtiya dagirkeran û berxwedana Efrînê dike.
Ji ber kêmbûna derfetan, Ebdulhemîd ji bermahiyên xaniyên hilweşiyayî tabloyên xwe xêz dike.
Ebdulhemîd destnîşan kir ku zarok li derdora wî kom dibin û êş û bîranên xwe pê re parve dikin. Her wiha anî ziman ku wî bi sedan gulên sînayê kom kirine û bi rengên ala kurdî rengîn kiriye dema Efrîn were rizgarkirin da ku pêşkêşî şervanên YPG, YPJ û QSD'ê bike.
Abdîn Ebdulhemîd di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Derfeta derketina welatên derve bi dest min dikeve lê naxwazin, dixwazim li ser li Efrînê li ser axa berxwedanê bijîm."…*ANHA*

## Li Şengalê perwerdeya zimanê dayîkê



Dewreya perwerdeya mamostayên Şengalê ya ji bo pêşxistina zimanê dayikê hatibû destpêkirin, bidawî bû.
Di destpêka meha Tebaxê de dewreyek a perwerdeyê ji bo 132 mamostayan hatibû destpê kirin. Dewreya perwerdê li Şengal û bajarokê Xanesorê ji aliyê Saziya Ziman û Perwerdeya Êzidiyên Şengalê ve (SZPÊ) ve hatibû destpêkirin. Perwerde 9'ê mehê bi awayek serkeftî bi dawî bû.
Mamosta Semîra Mehsin diyar kir ku perwerdeya wan ya ji bo pêşxistina mamosta pir baş derbas bû û got, "di vê perwerdê de me encamên baş girtin. Kedek mezin ji bo vê perwerdeyê hat dayîn. Emê bi vê perwerdeyê bikaribin zarokên gelê xwe yên li Şengalê perwerde bikin û fêrî xwendin û nivîsandinê bikin."
Mamosta Semîra da zanîn ku li ser zimanê dayîkê bi hezaran şehîd hatine dayîn û wiha dewam kir; "Li ser ziman bi hezaran şehîd hatine dayîn, bi pêşxisina zimanê dayîkê emê li xwîna şehîdan xwedî derkevin. Beriya fermanê zarok bi zmanê Erebî û zaravayê Kurdî yê Soranî dihatin perwerdekirin. Lê ev yek encamek xwe nebû. Niha em bi zimanê xwe yê dayîkê ku beriya hezar salan hatiye dixwinin."
Mamoste Dilgeş Hesen jî axivî û diyar ku ev 4 alin ew hersal vê perwerdê dibînin û wiha got, "ji bo em karibin zarokên xwe li ser fikrê Êzidîtayê perwerda bikin, di vê perwerdê de me dersên pêwîst dîtin. Her wiha dersên Êzidîtayî,Bîrkarî, Kurdî û hinek dersên din di perwerdê de hatin dîtin. Ev dewre ji bo me gelek baş bû."
Dilgeş diyar kir ku heya niha pirtûkên dersên wan ji Rojavayê Kurdistanê dihatin, lê niha saziya wan komîteyek ava kiriye ku bikarin bi xwe pirtûkan çêbikin û ewê di salên pêş de dersên xwe bi pirtûkên xwe bidin…*ROJNEWS*

# Hêjmara kesên bi nexweşiyê dikevin zêde dibe

***Li kapmên Şehbayê yên ku welatiyên Efrînê lê dimînin nexweşî zêde dibe. Berdevka Koordînasyona Tenduristiyê ya Giştî ya herêma Şehbayê Rîm Qermo, bang li rêxistina tenduristiyê ya cîhanê û hemû rêxistinên alîkariyê kir ku alîkariyê pêşkêş bikin da ku rê li ber belavbûna nexweşiyan were girtin.***

Rîm Qermo diyar kir ku hejmara kesên bi nexweşiya wêran (sil) ketine ji 45'an derketiye 77'an û destnîşan kir ku dema kesên bi vê nexweşiyê dikevin bi kesên din re danûstandinê dikin û xwarin û vexwarina nebaş dibe sedema berbelavbûna vê nexweşiyê.



Berdevka Koordînasyona Tenduristiyê ya Giştî ya herêma Şehbayê Rîm Qermo, bang li rêxistina tenduristiyê ya cîhanê û hemû rêxistinên alîkariyê kir ku alîkariyê pêşkêş bikin da ku rê li ber belavbûna nexweşiyan were girtin.
Rîm Qermo, li ser sedema belavbûna nexweşiya wêran, tedbîrên xweparastinê, her wiha projeyên têkildarî rêgirtina li ber belavbûna vê nexweşiyê axivî û destnîşan kir ku beriya dagirkirina Efrînê hejmara kesên bi nexweşiya wêran (sil) ketine 45 kes bûn û ew kes dihatin dermankirin. Rîm Qermo got: "Ji ber kesên bi vê nexweşiyê dikevin bi kesên din re danûstandinê dikin û xwarin û vexwarina nebaş dibe sedema berbelavbûna vê nexweşiyê, li aliyekî din jî kêmbûna derfetên tedawîkirin bû sedem ku nexweşî belav bibe."
Rîm Qemo anî ziman ku wan gelek civîn bi Rêxistina Tenduristiyê ya Navdewletî (WHO) û hin rêxistinên din re çêkirin û rewşa li kampan ji wan re vegotine, lê heya niha tu bersiv ji aliyê wan ve nehate dayîn.
Rîm Qerom diyar kir ku nexweşên li Kampa Berxwedan li gorî du beşan û rewşa wan hate kontrolkirin, derket ku bi nexweşiya wêranê ketine, hin kes berê bi vê nexweşiyê ketibûn û hinek din jî li Şehbayê bi nexweşiyê ketine.
Rîm anî ziman ku hin kes li navenda Heyva Sor a Kurd û Navenda Tenduristiyê ya navçeya Fafînê hatin tedewîkirin û rewşa wan ber bi başiyê ve diçe û diyar kir ku tevî vê yekê jî derfetên wan ên dermankirinê kêm in.
Berdevka Koordînasyona Tenduristiyê ya Giştî ya herêma Şehbayê diyar kir ku RêxistinaTenduristiyê ya Cîhanî (WHO) qebûl kiriye ku bi koordîneya Hevya Sor a Kurd a herêma Şehbayê navendeke tenduristiyê vekin û got: "Pêwîst e kadroyên herêmî hebin, da ku bi Navenda Nexweşiya Wêranê re koodîneyê çêke, her wiha me hemû alavên nexweşiyê xwestine."
Berdevka Koordînasyona Tenduristiyê ya Giştî ya herêma Şehbayê Rîm Qermo diyar kir ku amadekariyên veqetandina kampekê ji bo nexweşan tê kirin, nexwêş wê di bin çavdêriya bijîşkên pirspor de bin û bêne dermankirin…*ANHA*

## Idlib û Şoreşa Rojava



Medeni FERHO

Dagirkerên Kurdistanê ji komkujiyên li dijî Kurdan têr nebûn, vijdnaê hêzên navneteweyî jî şiyar nebû. Cîhan jî di xwîna Kurdan de difetise.
Sedsala bîstûyekê biqasî sedsala bîstan bi xwîn bûye. Komargeri, ber bi tîrantiyê ve diçe û sîstema komargeriya netewe-dewletan jî, êdî tîrantî ye.
Doh bû, li Tahranê sê tîranên dewletên komarger li hev civiyan. Rusya, Iran û Tirkiye!... Civîna Tahranê berdewama Astana bû.. Astana çavkaniya rijandina xwînê û komkujiyan e. Efrîn mînak e!.. Sê tîranan, li Tahranê jî xwestin destdirêjiyan li paşerojên gelan bikin, lê keliha Astana (8 Îlonê) hêrivî. Hêviyên tîran Erdogan yê Osmanî û şantajîst têk çûn.
Iran tîrantiya mollayan e, Rusya û Tirkiye tîrantiya yek mirovî ne. Sê tîran, ne li ser tîrantiya xanedaniyan, li ser bingeha xelef û selef hatine avakirin. Iran û Tirkiye, di aliyê siyasî, civakî û aborî de di nava erdhejê de ne û di aliyê felsefî de, copy'ek xerab ya feodal in. Desthilatdarên li Iran û Tirkiyê, olê, tarîqat, mezheb û feodalîteya rezîl û rûswa wek zirx bikartînin û bûne mînaka dewletên "pagan".
Rusya jî, xwedî navdariyek nukleerî û otorîteya polayî ye.
Ji bo ku di arêna sîyasî de cihê xwe bigirin, êrîşker in. Hem sûper kapîtalîst in, hem emperyal in, hem jî hawariyên aştiyê ne. Bi taybetî Tirkiyê, hem dagirker e, hem hawariya aştî û demokrasiyê ye, hem xulamokê emperyalîstan e, hem ant-î emparyalîst e.
Sê tîranan, di şerê Suriye de jî, ne durust bûn, bêbext bûn û li gorî "maslahat"guzariya xwe li cem hev in; wek sê sexmeyên meşka dew, hev disenidînin. Civîna Tahranê, sê sexme ji hev de xistin, meşka dew kete erdê û dew rijiya. Astana, êdî kavil e û dîroka kavilan jî weytî jarê û dilo jarê ye.
Hêrivandina Astana Idlib e. Idlib, wê bandorek mezin li şerê Suriye û li Şoreşa Rojava bike. Idlib qonaxek nû ye û metirsiyek ciddî ye. Divê Kurd bêhtir ji her demê şiyar tevbigerin.
Astana hêrîvî, lê dijminên Kurd, bi taybetî Iran û Tirkiyê, li dijî Kurdan êrîşên nû dane dest pê kirin.
Tirkiye, li Bakur, Rojava, Başûr û Ewropa êrîşên xwe didomîne. Tîran Erdogan, Festîwala Navneteweyî ya Kurdan bi desthilatdariya Elmanya da betal kirin. Niha jî, wek hewldana Musilê-Başîka, dixwaze li Idlibê, çeteyan ji tunebûnê rizgar bike. Wek hawariyê aştiyê diqîre. Tirkiye dixwaze tevahiya cografya Kurdistanê, bike cihê tirata çete û kontra.
Erdogan, ne tenê dîktator e, mirovekî malak, bêbext û talaqreş e; li Tahranê jî ji bo ku bandorê li Rûhanî bike, ji Şîrazî helbest xwend. Rûhaniyê jî, li Hewlêr- Qoyê komkujî kir. .
Tirkiyê li Efrînê rojane sucê mirovahiyê dike, cîhan bêdeng e. Dîktatorê epîlepsîk, piştî dagirkeriya Biradost, amadekariya dagirkeriya Kerkûkê dike.
Iranê, piştî civîna Tahranê, sê ciwanên Kurd, Ramîn Huseyîn Penahî, Zanyar Muradî û Loqman Muradî dardekirin. Di heman demê de, navenda PDK-Î û HDK, li Hewlerê-Qoyê bombarduman kir û komkujî kir. Cîhan dîse bêdeng e.
Car din tînime bîra PDK û YNKê; na Tahran, ne Enqera dostê we ne; Qendîl dostê we ye. Dagirker ne PKKe, Iran û Tirkiyê ne.
Idlib, qonaxeke nû ye û rejîma tîran Esad jî, li Qamişlo duyemîn car êrîşek provaqatorî kir. Pêşî bi Suryaniyan û dibistanên bazirganî provaqasyon kir; roja Şemiyê li Qamişlo, bi êrîşa li dijî hêzên asayişê provaqasyon kir.
Şerê cîhanê yê sêyemîn, şerê navbera gelan û tîranan e, şerê navbera gelan û netewe-dewletan e, şerê demokrasî ye. Di vî şerî de tenê Kurd li dijî "tîranên hevkar" şer dikin. Repertuwara teşqeleyan ya tîranên hevkar jî pirr dewlemend e.

## Pêdivîye ku zagon û maf netenê bi xumafbe ser rûpelan




Melek DEMÎRTAŞ

Dema ku bûyerek an jî biryarek derheqê mirova anjî gelekî de dijî mafê mirovan tê grtin. Erka Komeleya Mafê Mirovan li ser bisekine û bi cih bîn. Tevî ku gelek dewlet ser peyama Roja aştiya Cîahê imzakirin lê her ev biryar ji hêla wan tê bin pêkirin û dîsa rola sê maymûna dilîzin nabînin, na axfin û nabihêzin. Mînaka wê jî kiryarên Rêjîma Îranê siyasetdemdar û rewşenbîrên kurdê rojhilat Mîran penahî cezay, darvekirinlê lê birîn, tevî ku cezayê darvekirin dijî mafê mirovane lê, bê navber her derheqê gelê kurde pêk tîne, her wiha dewleta dagireker û faşîzt Tirkî da ku îradeya gelê kurd bişkîne; her diçe tecrîd ser Rêberê gelê kurd Abdulah Ocalan girandike. Da ku em xebat û erka KMM zanibin Rojnameya Ronahî serdana KMM ya Herêma Cizîrê kir, Hevseroka Komelêyê Evîn Cuma diyar kir ku dema bûyer anjî binpêkirina mafê mirovan li kur dibe bila bibe bê kirin erka meye ku em mudaxele bikin, jibe rev erka meye."

### JI 1'Ê ILONÊ BÛ 21'Ê ILONÊ

Hevseroka Komeleya Mafê Mirovan a Herêma Cizîrê Evîn Cuma derbarê Roja Aştîya Cîhanê û kiriyarên binpêkirina mafê mirovan wiha got: "Piştî şerê Cîahnê yê duyemîn, ku di encma wê şerî de 54 milyon mirov jiyana xwe ji dest dan, da ku ev bêne dawî kirin û aştî bê belav kririn di 1'ê Ilonê de wekî Roaj cîhanê ya aştiyê hate naskirin, ji ber ew roj roja ku şerê cîhanê ye duyemîn hatibû destpêkirin. Her wiha gelek dewlet ser vê peymê imzakirin, piştre dema ku di sala 2008'an de Netewên Yekbûyî YN hate damezrandin, ev peym guhert û bi biryara NY ew roja Aştiya cîhanî bû 21'ê Îlonê. Ji sala 2008'an de roja aştiya cîahê ji 1'Îlonê bû 21'ê Îlonê."

### 783 DAXWAZÎ J IBO SERDNA RÊBERTÎ NEHATIN PEJIRANDIN

Evîn da zanîn ku wekî KMM bi boneya roja aştî ya cîhanê daxwyanî hate xwendin, her wiha di hemen rojê de jî sekenek ji bo tecrîda giran a ser Rêberê gelê kurd Abdula Ocalan hate kirin. Ku parêzerên Rêbetî 783 daxwazî û name ji bo serdana, rewşa, tendrustî û rakirina tecrîda giran serê, ji dewleta Tirkî re pêşkêş kirin lê her nepejirandin û bi neyînê pêşwazî dikin. Tevî ku Rêbertî her banga aştiye dike û her ji bo daûstandina di navbera Kurd û Tirkî de bang dike, Rêbertî di navbera herdu milan ji bo aştiyê mîna pirkî ye. Ji ber ku şer dest pêbike di hundirê Tirkî de namîne dê di Rohilata Navî tevahî belav bibe, dewleta Tirkî bi êrîşî sînorekî namîne hewîrdorên xwe çi Başûr û Rojava yê Kurdistanê bike. Li gorî beleg, demîna û itrîfan; hemû Islama tund û cinsyetperst yanî çeteyên DAIŞ'ê ji sînorê Tirkî derbasî Rojava û herêmn û dewletan bûne."

### DI 21'Ê ÎLONÊ JI BO AŞTIYÊ PENÊL BÊ LIDARXISTIN

Evîn diyar kir ku ji bo roja aştiyê hîn çalakiyên wan dewam dikin û wiha got: "Di 21 Îlonê de li bajarê Rimêlan semîner ango panêleyek ser roja aştiyê ji parêzer, rewşenbîr û xebatkarên KMM re, her wiha dê li Kobanê jî heman panêle bê lidarxistin. Di heman demê jî Ji bo jinên parêzer, rewşenbîr û jin KMM ser mafê jinê di Sûrî de û rola jin di aştiyê de bên nîqaşkirin lê cihê ku lê bê lidarxistin hîn nediyare."

### KOMELEYA MAFÊ MIROVAN ERKA XWE PÊK BÎNIN

Evîn Cuma bal kişand ser kiriyarên rêjîma Iran û wiha got: "Em wekî KMM ji bo siyaset medarê kurdê Mîran Penahî ku tenê daxwaziya mafê û demokrasiyê kiriye, Rêjîma Îranê hukmê darvekirinê birî. Ji ber ku ev dijî pîvan û zagonên mirovaye, em wekî KMM li ber avahiya rêxistian YN daxwyanî xwend û nameyek nivîsand di riya Rêxistina YN şand ji Rêxistina Efûya Giştî ya navnetewî re û bang li rêxistinên mirovî kirin ku erka xwe ya li hemberî cezayên dervekirina kurdan pêk bîne. Her wiha Rêjîma Îranê berê bi aşkere kurd bi darvedikirin, lê dema niha da ku raya giştî baski li wan neke tenê di odeyeke girtî wan darve dike. Ev hemû sûçên binpêkirina mafê mirovahiyê ye, lê mixabin li beramberî wê rêxistin û dewletên ku bi mafê mirovan bang dikin bê dengin."

### ÇARESERİYA VAN HEMÛ ÇERAN AŞTÎ Û DİYALOGE

Hevseroka KMM Evîn Cuma wiha bi dawî kir: "Di jiyana mirovan de em nikarin bêjin ku aştî an jî tam tundî heyî heye, lê rêbazê şer û çek tenê kuştin û talankirina mirovan tînê, çareseriya vî şerî û bi dawîkirina kuştina mirovan û penaberan aştiye û diyaloge."



# Îdam wê têkoşîna me lewaz neke

***Rêjîma Îranê bi darvekirina Kurdan hewl dide pêşî li têkoşîna wan bigire. Rêjîma Îranê sê siyasetmadarê kurd ên din jî îdam kir. Dayîka Zanyar Mûradî Amîne Qadirî diyar kir ku bi darvekirinan wê gav paşde nevêjin û da zanîn ku ewê têkoşîna xwe hê bilindtir bikin.***

Dayîka Zanyar Muradî Amîne Qadirî diyar kir ku darvekirina kur û qetilkirina hevjînê wê hêrsa wan a li hember zilma rejîma Îranê mezintir kiriye û anî ziman ku ew ê têkoşîn û xebatê bi awayeke hîn xurttir berdewam bikin.
Dayîka Zanyar Muradî Amîne Qadirî têkildarî darvekirina kurê xwe û qetilkirina hevjînê wê Îqbal Muradî axivî.
Amîne Qadirî da zanîn ku darvekirin û qetilkirina kur û hevjînê wê bi tu awayî wan ji têkoşîna li dijî zilmê dûr naxe, wê berevajiyê wê têkoşînê bilindtir bikin.
Amîne bang li tevahî gelê Rojhilatê Kurdistanê û bi taybetî yê Merîwanê kir ku bawerî bi gotinên îmam Cumeyê Merîwanê neynin û di mizgefta wî de nimêjê nekin û got, "Îmam Cumeyê Merîwanê ji bo meqama xwe ji dest nede, zarokên me kir qurban."
Hikûmeta Îranê di sibeha 8'ê Îlonê de hersê girtiyên siyasî yên Kurd Zanyar Muradî, Luqman Muradî û Ramîn Hisên Pehanî darve kirin. Li Pêncewîn û Merîwan sersaxiya wan dewam dike.
Şeva 17'ê Tîrmehê bavê Zanyar Muradî, Îqbal Muradî ku Endamê Mafê Mirovan a Kurdistanê bû bi awayeke hovane li Pêncewînê hatibû qetilkirin. Hê 40 roj li ser qetilkirina Îqbal Muradî re derbas nebû, vê carê rêjîma Îranê kurê wî bi darve kir…*ROJNEWS*



## Mala Jinê sîwana hemû jina ye

Ferîşte NEZÎR

Ji destpêka şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê, bi armanca ku jin ji bendê koletiyê rizgare bikin Mala Jinê hate vekirin, girîngî da mefê jinê û her hewlda ku mafê jin ji kevneşopiyên civak û hişmendiya nejadperest biparêze. Ku ji avakirina wê heye roja îro gelek doz û pirsgirêk bi rengekî asayî çareser kirin, di avakirina têkiliyên ciavkî de rolek erênî lîst, û jin bû bingeha avakirina civakek demokratîk.
Da ku karûbarên Mala Jinê ya bajarê Qamişlo taxa Xerbî ji nêzve bizanibin me hevdîtin bi Rêvebira Komîteya lihevanîn di Mala jinê de Behiye Mirad kir û diyar kir ku gelek beş di navendê de hene û wiha got: "Beşa Rêvebirî, Komîte lihevanînê, arşîv û agehdarî) heye. Her wiha komîteya lihevanînê ji sê jinan pêk tê, ku ser pirsgirên jin û malbatî ên ku têne berdestê wan disekinin. Di heman demê de ev jin di van dozande xwedî tecrubene taybet yên eşîran ku dozên wekî zewaca temenê biçûk, diravdayîn û kuvandin(Hedanê)... hwd.

### PİRSGİRÊK Bİ RENGEKÎ EDALETÎ ÇARESER DİKİN

Behiya bal kişand ser makanîzmeya xebatê komîteyê û çawaniya girtina dozê wiha dom kir: "Di destpêka ku jin doze radestî me dike, em herdu milê dozê vedixwînin da ku agahî ji herdu terefan bigrin û paşê herdu kesan bi tekane hevdîtin dikin, da ku pirsgirkê û gotinên wan piştrast bikin. Û piştre ji bo nîqşakirina pirsgirêkê herdu milan bi hazirbûna komîteya lihevanîn tînin gel hev, armanc ku pirsgirêkê bi rengekî edaletî ji bo herdu milan çareser bikin, her wiha dema ku dozê tê jimere pêwîste ku ji komînê muhrkirî be. Ku bi rengekî xwezayî di destpêka pirsgirêkê de, ji bo çareserkirina wê pêwîste yek ser di çarçoveya erdingariya xwe serdana komînê bikin, lê dema ku komîna nekarîbû çareser bike şûnde ew doz bi mohra komînê radestê me tê kirin. Em ji milê xwe hewldan dikin ku hemû pirsgirê bi razîbûna herdu milan çareserbikin û mafê wan wekhev bidin."

### PİŞTÎ ÇARESEKİRİNÊ HÎN TÊKİLİYÊ ME Bİ WANRE DEME

Behiya da zanîn ku ew dema dawîkirin û çareserkirina pirsgirêkê ji bo nîqaşkirina raporên lihevanînê her heftî civînê ji komîteyê re tê lidarxistin û wiha got: "Dema ku doz çareser dikin, demek demdirêj didin herdu terfan, di vê navberê de jî her têkiliyên me bi wan re heye. Ji ber ku hind rewş hene zehmetin dema ku bi hemû hewldanên me ew doz anjî pirsgirêk çareser nebû, ji bo ku derman bibin em wan dişînin Navenda Şêwirmendiya derûnî, da ku doz di riya zagon bê çareserkirin bi imza û mohra mala jinê ew doz radestî Dadgeha gel tê kirin."




### MALA JIN JI BO LIHEVANÎNE NE DADWARIYE

Behiya tekez kir ku mala jin cihê lihevaînê ye ne dadwariyê ye û wiha pêde çû: "Em hemû doz û pirsgirkên ku ji hêla komîn anjî bîroyên gilî têne berdestê me, bi pirensîb û rêgezên lihevanîn bi parastin mafê herdu milan çareser dikin. JI ber ku wekî me diyar kir em bi rêbazên lihevanînê ye ne dadweriyê ye, her wiha da ku jin mafê û erkên xwe nasbike, em gelek perwerdeyên hînkirin û hişyarkirinê orgenîz e dikin."

### TÊKÎLİYÊN ME Bİ HEMÛ SAZİYAN RE HENE

Behiya Mirad bi bîrxist ku xebat di navbera me û rêveberiya Xwesre tê qordînekirin û wiha got: "Di hin rewşan de hey ku jin ji bo ku malabta xwe birêve bibe hewcedariya derftê kare, di riya têkiliyên me bi Rêvebiriyê li gorî derftên xwe kare jêre peyda dikin. Di çarçoveyek din de, demjimêra xebatê Mala Jinê ji 8 heya 2'ê nîvro ye, ku rewşek awerta çêbû doz radestî bîroya giliyan anjî Asayîşê tê kirin, paşê veguhestin me û pêvajoya pêwîst didin meşandin. Û Behiya diyar kir ku ji bo demên pêş projeyên wan hene wekî avakirin mala jinên ku rastî tundî an tehdîd tên avabikin û ev lêkolîn radestî cihê têkîldat hatiye kirin lê em benda pejirandinê ne."



Rêvebira komîteya Lihevanînê Behiya Mirad wiha bi dawî kir: "Pêwîst û erka mey ku em mafê jinê biparêzin, ji ber ku jin pêşenga avakirina civaka bi tendrustî ye."

## Jinên Reqayê bi roleke girîng radibin



Piştî bajarê Reqayê ji aliyê QSD'ê ve hat rizgar kirin, jinan jî ji nûve avakirina civakê de cih girtin û di xebatan de roleke sereke lîstin. Her wiha jinan di nava xebatên şaredariyê de cihê xwe girtin.
Jinên Reqayê di serdemên rêjîmê û DAIŞ'ê de gelek zehmetî kişandin û rola wan tenê bi mal hat sînordar kirin.
Piştî ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê bajar ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin jin jî ji nûve bûne xwedî rol. Jinan di nava meclis û komîteyan de cih girtin. Her wiha ji nûve avakirina civakê de bûne xwedî rol. Tevî xebatên jinan yên di gelek saziyan de, meclis û akademiyên taybet ji bo jinan hatin vekirin.
Komîteya Zabîte ya Şaredariya Gel ji 32 endaman pêk tê. Ji nav wan 10 jin di kontrolkirina sûkan de dixebitin. Komîteya Zabîte rojane di nav sûkan de bi armanca kontrolkirina buha û demên madeyên xwarinê de digere.
Têkildarî mijarê hevseroka Komîteya Zabîte ya Şaredariya Gel a Reqayê Seher El-Elî diyar kir ku jin bi xebatên di nav saziyan de rola xwe di avakirina civakê de dilîze û wiha got: "Jin ji bo rola xwe ya rastîn di civakê bilîze xebatên xwe didomîne."…*ANHA*

## Çend roj bi dayîka Cahîde re -1-

Avesta AMARGÎ

Gelê Kurd û bi taybetî dayîkên Kurdistanê, bi hêrsa 20 sale ku di dilê xwe de ragirtine, ji bo Rêber Ocelan, yê ku ji bo wan îfadeya vîn, can, Ruh, hebûn, nasname, çav, ziman, fikir û dile tekoşîneke bê hempa li her qada ku para xwe ji jiyanê girtine didin. Ev hêrs, Tol, kîn û Evîna bi kurdeyetiyê re hatiye strandin ev 20 sale nehatiye daxistin. Ev kerba ku em qala wê dikin tenê bersiva wê di nava dilê Kurdan de razaye. Evîna ku 20 sale li nav deryayê de tê ragirtin û ji evîndarên xwe dûr dijî, êdî kerba dilê dayîkên Kurdistanê û evîndaran bûye birîna mem û zînê, Xeçê û siyabendê, Derwêş û Edûlê.
Her dayîkek li Kurdistanê xwedî dîrok û çîrokeke cih rengî ye. Rastiya dayîktiyê bi derketina fikir û felsefa Rêber Abdullah Ocelan re xwe gîhand nasnameya rastteqînî. Dayîk xwebûyîne, xwebûyîn jî bingeha lêkirina tevahî kevirên bingehîn yên jiyana mirovane. Dayîktî ziman û çanda jiyanê ye, beyî wê ne jiyan xwe diafirîne û nejî jiyan xweşik û herikbar dibe.
Rastî û çîroka ku ez birim pênaseya van hevokan jî çîroka dayîka Cahîde ye. Dayîka Cahîde xwediyê 5 zarokane. Bi eslê xwe ji Efrînê ye, lê ew jî tevî malbeta xwe weke gelek malbetên Kurd bi salane li bajarê Helebê dijî. Dayîka Cahîde tevî malbeta xwe bi salane û bi awayekî çalak di nav kar xebatên şoreşa Kurdistanê de cihê xwe digre. Lawê dayîka Cahîde 26 sale di nav tevgera azadiyê da ye. Dayîka Cahîde heya dibistana navîn xwendiye û hemû zarokên xwe jî dane xwendin.
Dayîka Cahîde, ji roja ku tevgera azadiyê li rojavayî Kurdistanê dest bi kar û xebatan kiriye û heya roja îro bê ku rojekê dudiliyê li hemberî vê tevgerê, şervanê vê tevgerê û li hemberî Rêberê vê tevgerê bêjî bi sekneke vîndar, evînî, dildarî, lehengî û welatperwer di nav tekoşînê da ye. Sedem û bingeha tekoşîna dayîka Cahîde, ewqas kûre mirovan matmayî dihêle. Ya rastî piştî min dayîka Cahîde naskir û piştî ku min xwe li bihîstin û guhdar kirina vê çîrokê rakişand min xwe bi xwe re wiha got; ezê li deriyê kijan peyîvan bixim û vê çîrokê binivisînim? Wê hevok kijan peyîvan bipejirînin ku ez karibim vê çîrokê li hev bihunim. Cîroka dayîkê ya malbetî bi serê hêjayî nivîsandinê ye. Çîroka wê ya naskirina tevgera azadiyê bi serê xwe rojan û heyîvan dixweze mirov binivisîne. Çîroka wê ya şahidiya şerê helebê û herî dawî şerê Efrînê jî bi serê xwe ne. Lê çîroka ku, van hemûyan jî di hindirê xwe de, dihewîne ew rojên ku bi Rêber APO're jiyan kiriniye. Hemû jiyana dayîka Cahîde li dora vê heqîqetê hatiye hunandin. Min peyîvên ku girêdan û heskirina dayîka Cahîde ya li hemberî Rêber APO dijî re nedîtin. Lê, ez karim vê gotinê bi rihetî bêjim; ji bo dayîka Cahîde, Rêber APO her tişte. Dayîka Cahîde bi hezaran şervanên tevgerê re jiyan kiriye û wan heyîranî xwe kiriye. Dayîka Cahîde bi dilnimiziya xwe, bi heskirina xwe ya ji însan re, bi têkiliya xwe ya rast û dostanî, bi zanebûna xwe, bi vîna xwe ya ji pola yê, bi xwîngermî û hîsên xwe, bi girêdan û zakîra xwe ya xurt û bi çîroka xwe ya zêrîn şagirteke herî hêja ya dibistana Rêber APO ye.
Ez vê çîrokê bi dawî nakim, navber didim di beşa duyemîn ya nivîsa xwe de ezê bîranînên dayîka Cahîde yên bi Rêber APO re jiyan kirî parve bikim. Dayîka Cahîde û hemû dayîkên Kurdistanê her bijîn.

# Êrîşên Îranê tenê aloziyê kûrtir dike

**_Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê bi daxuyaniyekê êrîşên rêjîma Îranê yên li dijî başûrê Kurdistanê û darvekirina sê çalakvanên siyasî yên Kurd Ramîn Pinahî, Zanyar û Luqman Muradî bi tundî şermezar kir. PYD'ê got, "Îran jî weke Tirkiyê krîzeke cidî dijî. Ev siyaseta êrîşkirinê ya Îranê tenê aloziyê kûrtir dike û hemû alî jê zerarê dibînin."_**




PYD'ê bi daxuyaniyekê êrîşên Îranê li dijî Başûrê Kurdistanê şermezar kir û diyar kir ku Îran bi van êrîşên xwe serweriya Îraqê û Herêma Başûrê Kurdistanê binpê dike. PYD'ê bidarvekirina çalakvanên siyasî yên Kurd jî bi tundî şermezar kir.
Nerazabûnên li dijî êrîşên Îranê yên li ser Kurdan berdewam dikin. Di vê çarçoveyê de Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê bi daxuyaniyekê êrîşên rêjîma Îranê yên li dijî başûrê Kurdistanê û darvekirina sê çalakvanên siyasî yên Kurd Ramîn Pinahî, Zanyar û Luqman Muradî bi tundî şermezar kir.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku artêşa Îranê di 8'ê Îlonê de bi fûzeyan civîneke partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê li bajarê Koyê armanc girt û di encamê de hin beşdarên civînê şehîd bûn û wiha hate gotin: "Ev dijberiya Îranê piştî rêze bidarvekirinên li dijî çalakvanên siyasî yên Kurd pêk hat."
Di daxuyaniyê de wiha hate dewam kirin: "Em weke Meclîsa Giştî ya PYD'ê êrîşa li dijî serweriya Îraqê bi tundî şermezar dikin. Em siyasetên Tehranê ya dijberiya doza Kurdî li Îranê û derveyî wê şermezar dikin. Ev siyaseta wê tenê şer gurtir dike û hemû alî jê ziyanê dibînin.
PYD'ê got: "ji dema damezrandina PYD'ê ve û heta niha me zelal kir ku ne pêkan e netewek li ser hesabê neteweke din were avakirin. Nirxên dîrokî di encama xebatên afrîner ên hemû gelên Rojhilata Navîn de pêk hatine. Her wiha li gorî baweriya me xwe spartina yek mezhebên olî ji bo pişaftina bawerî û kêmnetewên cûda bê sûd e. Îran weke Tirkiyê aloziyekê dijî û hewl didin bi destwerdana dewletên cîran aloziyên xwe pûç bikin û ji berpirsyariya xwe birevin. Çareserî bi rêveberiyên xweseriyên demokratîk pêk tê û ji bo jiyana hevbeş di navbera gelan de çavên hemû gelên Rojhilata Navîn li serkeftina vê projeyê ne."
Di dawiya daxuyaniyê de PYD'ê sersaxî ji gelê Kurd û hêzên demokrasîxwaz re xwest.

## Li hember êrîşan divê Kurd yekîtiyê ava bikin




PJAK'ê diyar kir k di vê dema hestyar de ku celad ciwanên gelê Kurd darve dikin, pêwîst e hemû hizb û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê alozî û nakokiyên xwe bidin aliyekî û yekîtiyê bikin rojeva xwe.
Li navçeya Koyê ya Hewlêrê li dijî baregehên Hizba Demokrata Kurdistanê-Îranê (PDK-Î) û Hizba Demokrata Kurdistanê (HDK) ya li Kelhê êrîş pêk hat. Di êrîşê de 15 endamên HDK'ê û 2 pêşmergeyên PDK-Î'yê jiyana xwe ji ji dest dan û zêdeyî 40 kes jî birîndar bûn. Di heman rojê de ciwanên Kurd Zanyar Mûradî, Loqman Muradî û Ramîn Hisên Penahî ji aliyê rejîma Îranê ve hatin darvekirin.
Li ser bi darvekirina 3'ê ciwanên Kurd û êrîşa Koyê PJAK'ê daxuyaniyek nivîskî belav kir û êrîş û darvekirin şermezar kir. PJAK'ê di daxuyaniyê de got; "Em bi tundî êrîşa terorî ya rejîma Îranê ya li ser Koyê şermezar dikin. Em xemginiya ji ber şehîdên tekoşer yên gelê xwe tînin ziman. Di heman rojê de Ramîn, Loqman û Zanyar hatin darvekirin. Herwiha Îranê êrîşê baregehên HDK û PDK-Î yên li Koyê kirin, herwiha topbarankirina Herêmên Parastinê yên Medyayê berdewam dikin. Pêwîst e em van êrîşan hemû di çarçoveya konseptekê de bigirin dest."
Di daxuyaniyê de ev tişt hatin diyarkirin; "Divê em hemwextbûna êrîş û civîna li Tahran a di navbera Ruhanî, Pûtîn û Erdogan de asayî nebînin. Her çendî dihat gotin ku mijara sereka ya vê civînê Îdlîb be jî, lê ya rastî ew bû ku carek din Kurd bûne mijara sereke ya dewletên herêmê. Bê guman di navbera dewletên herêmê de, bi taybet di nava Îran û Tirkiyê de aloziyên kûr hene. Lê carek din Kurd bûye sedema yekbûna van dewletan."
Di vê dema hestyar de ku celad ciwanên gelê Kurd darve dikin, pêwîst e hemû hizb û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê alozî û nakokiyên xwe bidin aliyekî û yekîtiyê bikin rojeva xwe."

## Tecrîd li dijî qanûnên navnetewî ye



Parêzer û endamê Komîteya Dada Civakî yê Kantona Şehbayê Abdullah Mihemed Mistefa destnîşan kir ku tecrîd li dijî qanûnên navnetewî ye û diyar kir ku dewleta Tirk bi tecrîda li ser Rêber Ocalan dixwaze gelê Kurd qir bike.
Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di bin tecrîdeke giran de ye. Parêzer û malbat nikarin bi rêber Ocalan re hevdîtinê pêk bînin û ti agahî jê nayê girtin.
Parêzer Abdullah Mihemd Mistefa têkildarî tecrîda li ser Rêber Ocalan destnîşan kir ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji Sibata 1999'an ve li girtîgeha Îmraliyê bi tena serê xwe girtî ye û bi hemû cureyên zextan re rû bi rû maye.
Mistefa diyar kir ku armanca dewleta Tirk ji tecrîdê, qirkirina gelê Kurd û qedexekirina belavkirina fikir û felsefeya Ocalan e. Mistefa desnîşan kir ku komplo têk çûye û got, "Hemû gel gel ji fikir û felsefeya Ocalan bawer dikin."
Parêzer Mistefa diyar kir ku dewleta Tirk ji 2012'an ve tecrîdek giran li ser Ocalan ferz dike û hevdîtinên wî bi re asteng dike. Mistefa qanûnên navnetewî yên mafên mirovan bi bîr xist û diyar kir ku nabe mirov bên tecrîd kirinû da zanîn ku tecrîda li ser rêber Ocalan li dijî qanûnên navnetewî ye.
Di dawiyê de parêzer Abdullah Mistefa bang li hiqûqnas, rêxistinên hiqûqî û mirovî kir ku bi rolên xwe rabin û rê li ber binpêkirinên dewleta Tirk bigirin, tecrîdê li ser Ocalan rakin û rewşa wî ji raya giştî re eşkere bikin…
*ANHA*



## Polîtîk kirina hestan

Qasim ENGÎN

Tê gotin ku zanistî halek şiyar bûyîne ye. Her wiha tê zanîn ku di tibbê de ji bo hinek nexweşan, caran gotinên wek "zanîstiya xwe windakir" tê bikar anîn. Ev gotina di maneya tam razandinê de ango nivistinê de ye. Rêber Apo ji bo vê rastiyê, gotinên wek; Heqîqet; halê şiyarkirî ya rastiya ku di xewê de ye, bikar tîne. Di vê manê de, rastiya ku di zanista seratiyê de xwe derbasî zanista fikrandinê dike, gavek gelek mezin e.
Fikrandina yekem, fikrandina klanê ye. Bi vê fikrandinê hewl tê dayîn ku xweza, were fêmkirin. Ango zanista ku dixwaze xwe di xwezayê de biparêze, xwêdî bike û hebûna xwe bidomîne derdikeve pêş. Bi kurtahî, tiştê ku dikeve pêş, domandina hebûna xwe ya biyolojîk e. Ev form bi hezaran salan hebûna xwe domandiye. Lê em bizanin ku ev zanistiya ku bi hezaran salan hebûna xwe domandiye, nehiştiye ku formek jortirîn pêşbikeve.
Lê em dizanin ku di mijara civakbûyînê de rastiyên wek; malbat, qebîle, eşîr, gel, miliyet û netew pêşdikevin. Em jî dizanin ku piştî klanê rastiya ku herî zêde dirêj jiyaye forma malbat û aşîrê ye. Hê jî ev rastî hêbûna xwe berdewam dike. Lê bi cewaziyek, ew jî; di halê zanistiya yekem de bi aliqandin mayînê, ev rastî jî mijara lêpirsîne ye.
Me di nivîsa xwe ya berê de, gotibû ku "forma Kurdan a hezaran salan xwe dispêre ser eşîr û malbatê. Malbat jînek teng îfade dike. Her wiha eşîr jî. Û ev jîn bi hezaran sal li ser esasa ku xwe bispêre çiyan heta roja îro hatiye. Lê em bizanin ku form malbatî û eşîrtî be, fikrandin jî wiha teşe digire."
Ev teşe girtin nahêle ku kesekî kurd di rastiya xwe de bibe kurdek. Ango bibe Kurdistaniyek. Berevajî, tişta ku bi vê çandê û hişmendiyê pêşdikeve nahêle ku sînorên malbatê, eşîrê, gund, navçe, herêm, perçe were derbas kirin. Halê ku tê gotin, halê forma biyolojîk ango halê ku nabe gerdûnî tam jî wiha ye. Bêyî ku şaş were fêmkirin, ev tam jî halê teşeya zanista paşverû û hoveber ango prîmîtîve.
Lê em bizanin ku ev tiştên têne ziman di heman demê de çandekî îfade dikin. Dema ku tevna çandî hebûna xwe avadike cihana wî/ wê ya hûndirîn jî xwe re ava dike. Him jî, di xeyalan de bigirin heya hesretên xwe, di xwestekan de bigirin heya hêviyên xwe, hemûyan digire nava xwe û teşeyek dide. Bi gotinek din, binehişî bi tevahî xwe li ser bingeha vê çandê tijî dike. Û hebûna xwe wiha tamam dike.
Lê, bi fikrandên gelek teng yên malbatî û eşîrtî. Ev jî nehêştiye ku fikrandin giştî ango netewî pêşbikevin. Berovajî, ev fikrandina hiştiye ku tenê kes xwe, malbatên xwe, qebîleya xwe û eşîrên xwe an jî herêma xwe bifikirin.
Bi gotinek din, dema hest di asta malbatî û eşîrtî de aliqandî dimînin, ne gengaz e ku hestên wan jî polîtîk bibin. Ger polîtîk bûyîn, giştî û netew bûyîn bibe. Berovajî, yên ku hestên wan jî ne polîtîkin, mehkumê, fikrandina teng, malbatî heta perçegerî ne. Wek çawa îro qaşo di hinek siyasetan de em dibînin.
Bi hêviya ku, bi polîtîk kirina hestan em, giştî û netewî bifikrin!



# Rêveberiya Kobanê êrîşa Îranê şermezar kir

**_Nerazîbûnên li dijî êrîşên rêjîma Îranê yên li ser Kurdan berdewam dikin. Endamên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Firatê der barê êrîşên rêjîma Îranê ya li ser partiyên Rojhilatê Kurdistanê û darvekirina sê ciwanên Kurd daxuyaniyek da û dijmintiya Îranê ya li dijî gelê Kurd bi tundî şermezar kirin._**



Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a kantona Kobanê bi daxuyaniyekê êrîşa Îranê li dijî partiyên kurd li Başûrê Kurdistanê û bidarvekirina ciwanên Kurd şermezar kir.
Endamên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Firatê der barê êrîşên rêjîma Îranê ya li ser partiyên Rojhilatê Kurdistanê û darvekirina sê ciwanên Kurd daxuyaniyek da û dijmintiya Îranê ya li dijî gelê Kurd bi tundî şermezar kirin.
Daxuyanî li pêşiya navenda Meclîsa Rêveber a bajarê Kobanê hate xwendin. Di daxuyaniyê de ku li ser navê hemû sazî û dezgehên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Firatê hat xwendin de hate gotin ku dewletên cîhanê bi rêbazên qirêj li gorî berjewendiyên xwe tevdigerin û li ser vê bingehê li her çar parçeyên Kurdistanê çalakvanên Kurd ji aliyê hikûmetên desthilatdar ve tên kuştin û bidarvekirin.
Di berdewama daxuyaniyê de hate diyarkirin ku rêjîma îranê li pêş çavên hemû cîhanê azadîxwazan bi dar ve dike û tevî vê yekê rêxistinên navnetewî yên mafên mirovan li hemberî van kirinan bêdeng dimînin û wiha hate gotin: "di van demên dawî de rêjîma Îranê sê ciwanên Kurd ku bê sûc bûn, bi darve kir. Rêjîma Îranê ji aliyê din ve civîneke partiyên siyasî yên Rojhilata Kurdistanê li bajarê Koyê yê Başûrê Kurdistanê armanc kir û di encamê de 16 beşdarên civînê şehîd bûn."
Di dawiya daxuyaniyê de êrîşên rêjîma Îranê bi tundî hate şermezar kirin û saziyên navnetewî jî weke hevkarên êrîşên Îranê hatin binavkirin.

## Şêx Meqsûd mînaka çareseriya aloziya Sûriyê ye

Îkbal BEDRAN



Şêx Meqsûd yek ji taxên ku bi tena serê xwe li hemberî hovtirîn êrişên li Sûriyeyê qewimîne li ber xwe daye ye. Tax bi dewlemendiya etnesîte û çandên xwe ve navdar e. Ev hevgirtina çandên civaka Şêx Meqsûd, hovîtiya êriş û êrişkaran têk bir. Bi berxwedana gelên taxê ya ku xwe dispêre pîtoleya Netewa Demokratîk re vîna Şêx Meqsûd bi ser ket. Şêx Meqsûd di Sûriyê de mînaka çareseriya guncaw a zindî ye. Ji bo naskirina asta berxwedana gelên taxê rojnameya Ronahî li Şêx Meqsûd geriya û bi kesên ku ev berxwedan û pêşketinên li taxê jiyane re ev reportaj amade kir.

### CARINAN NANÊ HIŞK JÎ TUNE BÛ

Heyat Mustefa Şêxo Endama Rêveberiya Komîna Ş.Ferat li taxa Şêx Meqsûd wan rojan bi bîr tîne û dibêje: Dema ku çeteyan dor li taxê girtin û asta êrişên xwe tundtir kirin, gelên li taxê di yek çeperê de pişt dan hev. Êdî rengê ziman, cil û berg nîn bû. Hemû şêniyên taxê bi yek dil û biryarê li dora şervanên xwe kom bûn. Heyat hevgirtina gelên taxê bi hinek mînakan parve kir û got: Ji bo birîndar û şehîdan erebe dihatin amadekirin. Xwarin û vexwarina malbatan dihate dabînkirin. Me gelek rojên xwe bi savar û nanê hişkirî derbas dikir. Carinan ew jî tune bûn. Bi mehan me mastî nexwariye. Heyat dibêje: Di zivistanan de me nivîn, bîro, dolab û kumedînên xwe şewitandin. Me çayî jî li ser textik û cilên xwe dikeland. Heyat tekez dike ku zihmetiyên wan rojan bûne sedem ku gel û çandên li taxê zêde nêzî hev bibin û îradeya xwe bikin yek. Heyat dawiyê de bi bîr xist ku hevgirtina gelên taxê, serketina berxwedana Şêx Meqsûd misoger kir.

### BI HEZKIRINÊ EM BI SER KETIN

Dayîka bi navê Ewaş Mihemed, ku ew jî Endama Rêveberiya Komîna Serbixwe ye, derbarê rojên berxwedanê de gt: Em qet ji taxê derneketin. Her li kêleka şervan û gelê xwe bûn. Di aliyê parastinê de çi ji me dihat xwestin me dikir. Erka me yê sereke hevgirtina cebheya hundirîn bû. Ewaş dewam dike: Di nav gelên taxê de hezkirinek hebû. Her tişta xwe parve dikirin. Li ser kartonan şîv û çaya xwe çêdikirin. Ewaş dibêje: Ji bo ku eniyên me saxlem bimînin, milet xetên hundirîn qewmîm dikirin. Me serdana malbatên taxê dikir û morala gel bilind dikir. Hemû şêniyên taxê amade bûn di her mewziyê de cih bigirin. Ewaş dawiyê de dibêje: gelek mirov li kêleka me şehîd ketin û birîndar bûn. Tundiya êrişan israra me ya berxwedanê zêde kir. Biryar ew bû, heya ku berxwedanî heye em li kêleka şervanên xwe ne.

### HEVGIRTINÊ SERKEFTIN ANÎ

Cemîl Yasîn Hevserokê Komîna Ş.Fayiq li taxa Şêx Meqsûd ku ji pêkhateya Ereb e, cihê xwe di nava berxwedana taxê de girtibû û ew roj bi van gotinan bi me re parve kir: Ji eniyan pirtir çeteyan dixwestin îradeya şêniyên taxê teslîm bigirin. Pêkhateyan bînin hemberî hev. Bi rêbazên dorpêçê em bircî dikirin. Gelê taxê haya xwe ji vê lîstika qirêj a çeteyan hebû. Berovajî armancan, hevgirtina xwe ya civakî şidand. Bi yek vînê li ber xwe dan. Nivîn, mal, mesken, xwarin û vexwarinên xwe bi hev re parve kirin. Lê stû ji çeteyan re netewandin. Cemîl di dewama axaftina xwe de got: Pêkhateyên Şêx Meqsûd baweriya xwe bi YPG û YPJ hebû. Dizanîn ku; heyanî li ser rêça felsefeya Netewa Demokratîk bin, serkeftin misoger e. Bi riya vê hevgirtinê çarenûsa hemû şêniyên taxê diyar bû û serketin giştî bû.

### LI SER NALAN ÇAYA XWE KELANDINE

Ehmed Şêx Elî Endamekî Rêveber di komînên xeta Ş.Rûbar Qamişlo de ye. Ehmed ji kesên ku şahidiya rojên berxwedana taxê kiriye û cih tê de girtiye. Ehmed di vê derbarê de got: Taxê gelek zor û zehmetî derbas kir. Ne derman, diktor, xwarin û vexwarin, ne jî pêdiviyên jiyanê hebûn. Him rejîmê û him jî çeteyan dor li taxê girtibûn. Ehmed bi bîr tîne ku wan çaya xwe li ser paniyên solan kelandine û got: Qet ne dihat bîra ti kesî tiştekî ji ber hev veşêre. Gel bi xwe xwe birêxistin dikir. Her mirovekî taxê şervanek ser bi xwe bû. Ehmed tekez dike ku; ger ev cebheya hundirîn ne li hev bûya, wê berxwedana taxê bi ser neketiba. Ne ji şervanan bûya gel jî wê vîna xwe wenda kiriba. Bi riya berxwedanê hemû pirsgirêk çareser dibûn. Berovajî kîn û nefretan hevgirtina civakî ava bû. Ev îradeya gelan ku xwe di şiklê berxwedana Şêx Meqsûd de da der, îro ji hemû dunyayê re û bi taybet Sûriyê re bûye mînaka pratîk a çareseriya asloziya vî welatî.



## Vebijarka Rojhilatanavîn demokrasî ye

Zekî BEDRAN

Tirkiye berî demeke kurt dixwest li Rojhilatanavîn bibe dewleteke pêşeng. Xwedî li gelê Filistînê derdiket û ji Îsraîlê re digot "one minute". Navbera wan û Siûdiyan gelek baş bû. Bi saya welatên Ereb pereyê germ derbasî Tirkiyê dibû. Niha jî polîtîkaya Tirkiyê ya derve ji rêya xwe derketiye. Têkiliyên wan bi DYE û NATO'yê re xirabe. Erdogan derbeya esasî li Misirê xwar. Piştî ku Mûrsî bi darbeyê hat xistin şansê Birayên Misilman ku li seranserê Rojhilatanavîn bibin desthilat, têk çû. Ji ber ku Erdogan di heman xetê de bû hesiband ku pêşî lê hat vekirin. Lê niha ji derveyî Qatar'ê têkiliyên ti welatekî Ereb bi Erdogan re nema.
Tirkiyê qaşo dixwest lîdertiya eniya Sunî bike. Îro ji bo ku bi Îranê re têkiliyên xwe baş bike diberpite. Di aliyekî de li dijî eniya Şiî, di aliyê din de ji ber dijmintiya li Kurdan mehkûmî Îranê ye. Ji ber ku xwest pereyên reş yên Îranê paqij bike û jê sûdê werbigre li Emerîkayê hat darizandin. Ji vê jî wêdetir Tirkiye weke hêza NATO'yê ya bingenîn niha ketiye hembêza Rûsyayê. Dîsa ji ber dijminatiya li Kurdan bertîlê dide Rûsyayê, îhaleya santrala atomê dide, û fuzeyên S-400 dikirre. Ya herî xirab, weke parazvanê çeteyên çekdar yên li Sûriyê bû muxatabê Rûsyayê. Ji gelek herêman komên çekdar anî li Îdlibê bi cih kir. Sedema van hemûyan ew bû ku ji bo dagirkirina Efrînê piştgiriya Rûsan bigire. Efrîn dagir kir lê çete li wir dimînin. Rûsya niha dibêje, "An çeteyên xwe bigre an jî ji bo şer razî be". Tengaviyên Tirkiyê wê hê mezintir bibin. Aborî êdî di rewşeke xirab de ye. Aborî êdî nikare barê şer zêde hilgire. Her wiha li Sûriyê weke ku Tirkiyê dixwest lê nehat. An wê çeteyên xwe bifiroşe an jî wê li cem wan şer bike. Êdî xwedî wê hêzê nîne ku li ber Rûsyayê rabe. Zincîra Kurd di stuyê wî de ye. Dagirkirina Efrînê û Sûriyê wê li lingên wî biale. Erdogan wê qebûl bike ku Pûtîn birayê mezin e. Dema ku Pûtîn bibe kekê Erdogan wê caran sîleyan jî lê bide. Dema ku li ber Rûsyayê rabe wê nikaribe li Sûriyê bimîne. Hêzên demokrasiyê yên Sûriyê wê wan û çeteyên wan biqewitînin.
Tirkiye bi DYA'yê re dike qirecir. Yên ku nizanibin wê bihesibînin ku Tirkiye dij-emparyalîst an jî dij-kapîtalîst e. Li Tirkiyê hikûmetên bi qasî Erdogan û alîgirên wî ku pere weke xweda dibînin û dikin milk nehatiye dîtin. Hemû pirsgirêkên bi Emerîka re ji ber dijmintiya li Kurdan e. Dixwazin ku Emerîka jî weke wan dijberiya Kurdan bike. Dibêje "ji Sûriyê derkeve ku ez êrîşî Kurdan bikim." Berê bi Rûsyayê re jî bi pevçûn bû. Piştî ku Rûsan bi Erdogan re lihevkir û li Efrînê bûn hevparê sûcên miravahiyê, wê demê dev ji qirecirê berda.
Tirkiyê dixwest li Rojhilatanavîn hespê xwe bibezîne. Qaşo stratejiyên wan yên kûr hebûn. Lê nikaribû ji dagirkeriyeke hoveber, teqlît û çor derbas bike. Nikaribû bi senteza Tirk-Îslam ji vê yekê derbas bike. Tenê li der û hundir bi avakirina dijmin û gurrkirina nijadperestî û netewperestiyê dikarin faşîzmê li ser piyan bigirin. Îtîfaqa faşîst a Erdogan û Bahçelî wê Tirkiyê hê zêde tengavî bike. Me berî niha jî anî bû ziman. Fatûraya qirecirkirina bi Emerîkayê re jî heye. Her kes ne weke Kurdan e. Dibe ku Kurdan bikujin, axa wan dagir bikin û paqijiya etnîkî li ser wan bikin. Heta niha hêzeke Kurdan ya ku hesabê bixwaze tune bû. Tifaqên wan yên navnetewî jî tunebûn. Ji ber wê kengî bixwestana li ser wan dixistin. Lê DYA ne wisa ye. Dema ku hefsarê dolar bikşînin, wê faturayeke bi mîlyaran dolar ji wan derxin. Ji ber wê Erdogan qibleya xwe şaş kiriye. Dihesibîne ku wê bi tumenê Îranê û rûbleyê Rûs ku ti qîmeta wan tine ye, krîza aborî derbas bike. Dibêje, "em pereyên mîllî bikarbînin." Pere û sermaye wisa mîllîbûnê, dîn û terîqetan nas nake. Ti qîmet û hukmê van gotinan ji bilî ku xîtabî kolanan bike, tune ye.Erdogan kesekî pragmatîst û derewkarekî basît e. Ev yek karekterekî tîpîk yên rêveberên faşîst e. Heta duh gotinek nehişt ku ji Angela Merkel re nekir. Niha jî ji bo ku tengavîbûna xwe derbas bike xwe davêje hembêza Almanya û welatên din yên Ewropayê. Lê ji aliyê din ve bi qasî ku êrîşî Dayîkên Şemiyê bike zordest e. Ji bo ku van nakokî û tengaviyan binirxîne pêdivî bi muxalefeteke demokratîk heye. Eşkere ye ku êdî CHP ne xwedî wê karekterê ye. Bêyî ku rê bidin lîstikên CHP'yê yên ku dixwaze nava muxalefetê vala bike, ji bo berxwedanê û rêxistinkirinê şert û merc guncaw in. Zext zêde ne lê rastî jî êdî nayên veşartin. Dem dema ku pala xwe bidin rastiyan faşîzmê derbas bikin û demokrasiyê li Rojhilatanavîn belava bikin.